

Li-neynikxistina penceşêrê çi ye?



Li-neynikxistina (screening) roviyan beşekî girîng e ji bo lînerîna tenduristiya te

Li-neynikxistina (screening) penceşêrê têtên hêsan ku li nîşanên destpêkê yê penceşêrê digere, yan li şert û mercên ku dibin sedema penceşêrê digere. Testên li-neynikxistinê, berî tu guhertin di laşê te de çêbibe ew dikare penceşêrê bibîne. Dema penceşêrê zû were dîtin, dermankirin hêsantir e.

Li Australya, sê bernameyên neteweyî ye li-neynikxistinê hene. Ev ji bo penceşêra pêsîrê, rovî û malzarokî ne.



Li-neynikxistina pêsîran



Penceşêra pêsîrê di jinan de penceşêra herî berbelav e

- Divê jinên 50-74 salî her du salan carekê mamogramê bikin (herweha jê re tê gotin X-raya pêsîran).
- Mamogram baştirîn rê ye ji bo dîtina penceşêra pêsîrê berî ku were dîtin yan heskirin.
- Ji bo hemî jinên 50-74 salî girîng e ku werin têtstkirin, ji ber ku piraniya jinên bi penceşêra pêsîrê hatine teşxîskirin dîroka malbatê ya nexweşiyê nîne.
- Mamogramên bi BreastScreen NSW **bêpere** ne. Şandina ji doktor ne hewce ye.

i Çi bikin:

- Ji bo hevdîtîne telefonê **13 20 50** bike yan serdana **book.breastscreen.nsw.gov.au**
- Telefonê **13 14 50** ji bo daxwaza wergêr bike.
- Ji bo zaniyariyên bi zimanê te serî li **breastscreen.nsw.gov.au** xîne.



Li-neynikxistina roviyan



9 ji 10 nixweşên ku penceşêra rovî hene dikarin bi serfirazî werin dermankirin heke zû were dîtin

- Mêr û jinên 50-74 salî yê ku xwedî karta Medicare yan Department of Veterans Affairs in, her du salan carekê kîtek ji bo li-neynikxistina penceşêra roviyan **bêpere** di postê de tê şandin.
- Li-neynikxistina penceşêra roviyan dikare jiyana we rizgar bike, ji ber ku ew çêtirîn rê ye ku penceşêra roviyan zû were dîtin.
- Têsta penceşêra roviyan zû û hêsan e ku mirov dikare li mala xwe bike.

i Çi bikin:

- Dema ku bi postê gihîşt, kîta xwe ya têtstkirina roviyan bi kar bîne.
- Serî li **dothetest.com.au** xîne ji bo zanibî dê kengê kîta din were.
- Ji bo zaniyariyên din telefonê **1800 627 701** bike.
- Telefonê **13 14 50** ji bo daxwaza wergêr bike.
- Ji bo zaniyariyên bi zimanê te serî li **health.gov.au/resources/translated** xîne.



Li-neynikxistina malzarok



Li-neynikxistina malzarokî dikare pêşî li penceşêra malzarokî bigire

- Jinên 25-74 salî divê her pênc salan carekê têtsta malzarokî bikin.
- Hûn dikarin hevdîtîne bi doktor yan bi hemşîreya xwe ya herêmî re Têsta Li-neynikxistina Malzarokî çêbikin.
- Hin doktor vê yekê **bêpere** pêşkêş dikin. Dema çêkirina hevdîtîne hûn dikarin lêçûnê bipirsin.
- Penceşêra malzarokî dikare bi kirina Têsta Li-neynikxistina Malzarokî were pêşîlêgirtin. Ev ji ber ku ew li enfeksiyonek e bi navê human papillomavirus (HPV) digere, ku dibe sedema penceşêra malzarokî.

i Çi bikin:

- Bo zanîna dema Têsta Li-neynikxistina Malzarokê telefon bikin ser **1800 627 701**.
- Hevdîtîne bi doktor yan bi hemşîreya xwe re çêbike. Ji bo pêkanîna têtstê tu dikarî daxwaza doktor yan hemşîreya jin bikî.
- Telefonê **13 14 50** ji bo daxwaza wergêr.
- Ji bo zaniyariyan, serî li **cancer.nsw.gov.au/cervical** yan **cancerscreening.gov.au/cervical**